


Nirxandina Pirtûka Xêrî Şingalî “Li Çiyayê Şingalê Qebqeba Kewê Nêr e, Komeka Têkistêt Folklorê”

Enstîtuya Kelpepûrê Kurdî. Duhok (2011). (Bergê yekem: 385 rûpel, bergê duyem : 311 rûpel)

Hikmettin Athr*



Enstîtuya Kelpepûrê Kurdî bi her du şaxên xwe yên Silêmanî (2003) û Duhokê (2007) ji sala 2003an û vir ve bi taybetî li Başûrê Kurdistanê bûye navendeka qehîm ji bo xebatên folklorê kurdî. Ev sazgeha giring heya niha nêzîkî 260 kitêbên li ser folklorê kurdî çap kirine. Herwiha piştgirî daye berhevkarên ku ew bikarin bi alîkarîya madî-manewî ya sazgehê, xebatên xwe berdewam bikin. Enstîtu ji bo parastina çand û folklorê civaka êzîdîyan ku her dem tûşî komkujîyan bûne projeyeka taybetî bi navê “kultûrê êzîdîyan” xistîye nava bernameya karên xwe.

143

Xêrî Şingalî jî yek ji van kesan e ku di binê banê vê sazgeha giranbiha da, li ser folklorê civaka kurdên êzîdî xebat kirine. Ji bilî vê xebata wî, xebateka wî ya bi navê *Qevdek Ji Dûrikêt Çiyayê Şingalê* jî di nava weşanên Enstîtuyê da cihê xwe girtîye. Di nava pirtûkên wî da ya herî giring ku em dê di vê nivîsê da li serê bisekinin, bi navê; *Li Çiyayê Şingalê Qebqeba Kewê Nêre, Komeka Têkistêt Folklorê Êzdîyan e*.

*Dr. Vekolê Serbixwe. Dîyarbekir. E-mail: bedranh@gmail.com

Ev pirtûka giranbiha di sala 2011an da ji alîyê navenda Duhokê ya Enstîtûya Kelepûrî Kurdî ve, li çapxana Serdemê ya li Silêmanîyê hatîye çapkirin. Pirtûk ji du bergan pêk dihê û berga pêşîn 385 rûpel û berga duyem jî 311 rûpel in. Pirtûk bi kurdîya kurmancî û bi alfabe ya erebî hatîye weşandin. Berhemên ku di pirtûkê da hatine komkirin bi piranî ji deverên Şengal û Şêxanê û bi giştî ji Başûrê Kurdistanê hatine berhevkirin.

Şengalî, di berga yekem da hem efsane û parçeyên ji mîtolojîya civaka êzîdîyan bi cih kirine û hem jî cih daye versiyonên destanên evînî û lehengî yên ku di nava civaka êzîdîyan da dihêne gotin. Şengalî berga yekem ya xebata xwe, li ser sê pişkan dabeş kirîye. Di pişka yekem da bêtir cih daye efsane û mîtolojîya civaka êzîdî. Di vê pişkê da *Efsaneya Mîr Mih û Felekê* gelekî balkêş e ku naveroke wê ji gera li nemirîyê pêk dihê û Destana Gilgamêş diine bîra me. Mîr Mih dema ku zarok e hîn dibe ku mirin heye û li ser vê dipirse ji pîrejînekê bê gelo cih heye ku li wê derê mirin tune be. Pîrejî jê ra dibêje ku mirin li ba felekê tune ye û li ser vê gera Mîr Mih ya nemirîyê dest pê dike. Di vê efsaneyê da motîfa *Girê Heyhayê* derbas dibe ku li ba *Quba Felekê* ye û dema ku mirov digihîje wê derê hemû rabirdûya wî dihê bîra wî û dike hey û hay. Herwiha efsaneyên li ser kralên babil û asûrîyan yên wekî Nebûqednasir û Hamûrabî jî giring in. Li gorî van berheman civaka êzîdî wisa bawer dike ku van kesayetên êzîdî bûne. Di vê pişkê da em rastî bawerîyên kevnan yên wekî Şemsanî (Mîtraîzîm) dihên ku êzîdî wisa bawer dikin ku dîne wan ji nava Şemsanîyê derketîye. Herwiha qedemguhastin yan jî kirasguhertin jî di van efsaneyan da wekî bawerîyeka vê civakê derdikevin pêşberî me.

Di pişka duyem da Şengalî destanên navdar yên ku di nava piranîya civaka kurdan da dihên zanîn bi cih kirine û varyantên wan yên ku di nava civaka êzîdîyan da dihên gotin danîye pêşberî me. Ev destanên wekî Mem û Zîn, Xecê û Sîyehmed, Zembîlfiroş û Gulxatûn û Xanûy Lepzêrîn nîşanî me didin ku civaka êzîdî versiyonên taybetî yên van vegotinan însa kirine ku em şopên bawerîya êzîdîyê di wan da dibînin.

Di pişka sêyem da Şengalî di binê sernava Şer û Eşq û Malwêranî da bi piranî cih daye hikayeya dirêj ya malbata Derwêşê Evdî, bavê wî û destana trajîk ya Derwêşê Evdî û Edûlê. Ev beş derfeteke giring dide vekolerên folklorê ku di navbera varyantên ji nava kurdên misilman û kurdên êzîdî da miqayeseyê bikin.

Di berga duyem ya kitêbê da Şengalî bêhtir berê xwe daye stranên gelêrî ku ji dengbêjên herêma Şengal û Şêxanê berhev kirine. Şengalî vê berga pirtûkê jî li sê pişkan ango beşan veqetandîye. Di pişka yekem da di binê sernava *Serhatîyê Bi Stran* da cih daye tekstên gelek stranên gelêrî wekî Şêx Mûsa, Besa Xelîl û Biroyê Şerqî, Edûl û Gênc Xelîl Axa, Fermana Ferîq Paşa, Lawikê Metînî û Gula Şêmerzê û gelekî stranên din. Di pişka duyem da Şengalî di binê sernava *Stranê Eşq û Evîndarîyê* da cih daye stranên gelêrî yên mîna Xezalê, Koçerê, Gewrê, Lawikê Simoqîya û gelekî stranê din. Di pişka sêyem da Şengalî di binê sernava *Stranê Şer û Tengavîya* da cih daye stranên mîna Karwano, Xalo, Şerê Mala Quto û Nêsir, Simayil Axa (Simkoyê Şikaka) û gelekî stranê din ku hem bi taybetî li deverên civaka êzîdîyan dihên zanîn û hem jî li hemî Kurdistanê.



Di dawîya her du bergan da jî berhevkar di heqê jêderên xwe da agahîyên berfireh dane û tevî jînameya wan, sûretên wan jî tev li pirtûkê kirine.

Dema ku em bala xwe didin rê û rêbaza berhevkar, dihê dîtî wî di xebata xwe da metodên zanistî yên lêkolînên folklorê bi kar anîne û bêyî ku midaxele li ziman û awayê vegotina jêderan bike, di her du bergan da vegotinên wan bi cih kirine. Lê di jêrenotan da hema bibêje di her rûpeleka pirtûkan da, pêşî di heqê vebêjên berheman

da û dema berhevkarîyê da agahî dane bi dû ra di her cihê ku peyv yan jî têgiheka taybetî derketibe pêş, di jêrenotan da di heqê wan da agahî dane. Heta em bi rêya van jêrenotên berhevkar xwendineka bimifatir dikin û hem di warê erdnîgarîyê da hem jî di warê bawerîya êzîdîtîyê da gelek tiştên nuh hîn dibin. Her du bergên vê xebata giranbiha jî vî alîyî ve dibin mînak bo berhevkarên folklorê.

Dema ku em metinên di xebata Şingalî da dixwînin, em ne tenê hin serpêhatî, destan yan jî efsaneyên herêmekê dixwînin; em di heman demê da şahidî li serpêhatîyên taybetî yên civaka êzîdî, tirs û hêviyên wan û awayên taybetî yên vegotina wan dikin. Wekî mînak gelekî caran dema ku vebêj vegotina xwe neqil

dikin formelega wiha di navberê da dubare dikin: “*Belê Xudê belayê ji ser êzîdiya û guhdara bide alî*” (Berga Yekem, r: 42)

Di heman demê da em ji van metinan tê derdixin ku êzîdî xwe bi gelek nasnameyan pênase dikin lê nasnameya eşîrî û dînî ji bo wan yên herî li pêş in. Heta carinan nasnameya eşîrî wekî nasnameyeka jorîn derdikeve pêşberî me ku di binê wê nasnameyê da gelekî nasnameyên din yên dînî û etnîk hene. Wekî mînak di rûpela 245an ya berga yekem da, di vegotîneka gelêrî ya bi navê *Qubadî Şewêş* da vebêjê vegotîne wiha dest bi vegotina xwe dike: “*Gelî bira wextê Xudê ne. Li wextekî bireka Paloyê û bireka Mila (Ev du eşîrên kurd in li Bakûrê Kurdistanê) dijmin bûn. Vêca êzdî tê hebûn, fileh tê hebûn, kurd tê hebûn, hemû kes tê hebûn...*”

Bi rêya vê xebatê em dibînin ku êzîdî ji bo civaka êzdî nasnameyek ew çend xurt e ku ew pîrî caran ji nasnameya civakî-çîmî, erdnîgarî û etnîk jî li pêştir e. Di berga yekem da di rûpela 150yan da di Destana Êzdî Mîrza Kendalî da; zilamek du zarokên êzîdî diqefêle ku ketine nava zevîyê wî yê pîvazan û ji wan dipirse: “*Kuro hûn ji ku ne?*”, zarok bersiv didîne dibêjin “*Em êzîdî ne?*”. Dîsa di Destana Derwêşê Evdî û Edûlê da, Derwêş ji Zor Temir Paşa dixeyide û diçe alî Serhedê û dibe mêvanê Ehmed Begê ku begê Heyderan û Zîlan e. Li wê derê xelkê hundirê konê jê dipirsin: “*Tu ji ku yî?*”, Derwêş dibêje: “*Welle ji vê xerbê me.*” Dîsa dipirsin dibêjin: “*Tu çi miletî?*” Derwêş dibêje: “*Welle ez êzîdî me.*” (Berga Yekem, r. 321)

Vê xebata giranbiha çawa ku di warê xebatên li ser folklorê êzîdîyan da wekî berhemeka bingehîn e wisa jî mînakê giring e ji bo berhevkarên folklorê ku xebata sehayê ya folklorê divê bi çî awayî bihê kirin.

Efsane, hîkaye, destan û stranên ku di vê xebatê da hatine berhevkirin, bi piranî hevpar in bi yên di nava civaka kurdan da. Lê em lê rast dihên ku hin serhatî yan jî hîkayetên ku di vir da derbas dibin taybetî ne bi civaka êzîdî û di nava komên din yên civaka kurdan da nahêne dîtin. Wekî Efsaneya Mîr Mih, Serhatîya Ferîq Paşa, Koçek Brahmî û gelek qewamên din. Her çendî ku piranîya hîkaye, stran û destanên din hevpar bin, bi yên di nava civaka kurdan da jî, em bi rêya vê berhemê jî dibînin ku civaka êzîdî van berheman li gorî taybetîyên xwe yên dînî û civakî/herêmî jî nu ve şîrove kirine û mohra xwe li van tekstan xistine. Bi taybetî di Destana Zembîlfiroş, Derwêşê Evdî û Edûlê û Kela Dimdim da ev taybetî derdikevin pêşberî me.